Dumah.k: E . Qasimlo

damezrandin. Di demeke kurt de, P.D. K. di nav gelê Kurd e, gol vedide û bi hezaran xort û E. Qasimlo jî, di nav wan de, di nav refê Partî de, cî digrin.

Di sala 1952 an de. E. Qasimlo, berê xwe dide Ewropa. Li zanîgehên Parîs û Çîkoslaviya diktora distîne. Û li zanîgehên Parîs û Piragê mamostetiyê dike.

Li Ewropa , di ber xwendina xwe re, bi dil û can, bi kar û barê partiya xwe radibe û di navbera Ewropa û Kurdistanê de, dere û tê. Di kongirê sêyemîn ya P.D.K Îran de,wek sekretêrê giştî tê helbijartin .

E. Qasimlo, bi hestekî berpirsiyar û zanistî, li ber pirsa Kurdî, di Kurdistana Îranê de radiweste û bi bîr û bawerî ew û hevalên xwe, pirogirameke aqilmend, li gorî merc û heyama heyî, ji Kurdan re datînin. Û dirûşma - Demoqrasî ji Îran re û otonomî ji Kurdistan re- hildidin. Porogiram û dirûşma Partî ya aqilmend, dibe sedema sereke ji pişgiriya dostan , li welatên biyanî, ji Kurdan re. Gava E. Qasimlo, diçe Ewropa, komelên mirovatî , pir kesên siyasetvan û akadimîk rêz û hurmet jê re digirtin. Bi saya Qasimlo, dengê Kurdistana Îranê giha derve û deriyên pişgiriyê jê re vebûn.

Di Subata 1979 an de, textê padişahê Îranê hildiweşe û Xumeynî destlatê distîne. Di wê firkê de û ji bo birêvebirina kar û barê herêma Kurdistanê, pêşmergan, polîs û leşkerên Îranê ji herêmên Kurdistanê derxistn.

Piştî biserketina rijêma Xumeynî û amadekirina destûrekî nû ji welêt re, E. Qasimlo dibe endamê (مجلس الخبراء) û kar û barê xwe dike ku, nama Kurdan (**cihê her kesî ji bo kar û avakirinê di vî welatî de heye**) . Lê, Xumeynî, pêşniyara wî napejrîne û dibêje : **ev nûnerê Kurdan --dijminê Xewdê ye-** . Û şerekî hov û dijwar , di Tebaxa 1979 an de, dajo ser Kurdan . Di sala 1980î de, şerê Îraq û Îranê destpêdike. Di bin siya wî şerî de, herdu destlatên Îran û Îraqê, gund û malên Kurdan wêran dikin. Di dawiya wî şerî de, herdu destlat ji hev ketin û li ber nefesa dawiyê bûn. Li pêş vê rastiyê, deslata Îranê bi pilan, têklî bi P.D.K. re li dar xistin. Civata yekem, di 28 û 30î Berçile 1988 an de, li Viyêna li dar ket , berhemên wê civatê pir başbûn . Civata duwem di 20 î Çile 1989 an de li dar ket. Di wê civatê de, xuyabû ku, otonomî ji Kurdan re pir nêzîke, tenê şêweyên bi karanîna wê dimîne. Piştî şeş heyvan, Dr. Qasimlo li kongirê sosyalîstên dewlî beşdar dibe. Destlata Îranî, careke din ji P.D..K dixwaze ku, civat bigere. Di 12 ê Tîrmeha 1989 an de, hevdîtin li Viyêna li dar ket. Di vê civatê de, bilî herdu nûnerên Îranî Mihemed Cefer Sehrarodî û Hacî Mistefawî yên berê, Emîr Mensor bozorciyan jî beşdar dibe . Roja din, 13 ê Tîrmehê, li kat 19.30 an, li cihê berê, hersê nûnerên Îranê, bi xinanî , Dr. Qasimlo, Ebdela Azar – Endamê Komîta navendî ya P.D.K - û Pr. Fadil Resûl – ji Kurdstana Îraqê – dikujin .

Di navenda Ewropa de, di dema guftûgo ji bo rawestandina şer û çareserkirina pirsa Kurî di Îranê de, Nûnerên dewleta Îslamî vî karê teror dikin û kes jî, ji wan nayê girtin û cezakirin.

Di 20 ê Tîrmehê de, bi beşdariya 2000 mirovên ku, ji hemî deveran hatine, - **D.R.(11)**